Ji Layê Şikl û Naverokê ve Nirxandinek li ser Mîrata Edebî ya Mela ‘Arifê Dêrsilavî

Kurte

Bê guman di nava rûpelên dîroka hemû neteweyan de şa‘ir, edip û nazimên wendabûyî, derneketine holê an di dîroka edebiyatê de bi şayestayî cih negirtine dê hebin. Dem dem di edebiyata Tirkî, Kurdî û Farsî de derketina berhem û nivîskarên bi vî rengî vê nêrînê diçespîne. Mebesta vê xebatê danasîna berhem û jiyana Mela ‘Arifê Dêrsilavî ye ku hetanî niha ji teref camî‘eya edebiyatê ve bi şayestayî nehatiye nasîn. Mela ‘Arif, tevî berhemên menzûm yên ‘ilmî û edebî, bi şa‘irtiya xwe jî derdikeve pêş. Lêbelê hetanî roja me danasîna berhemên wî nehatine kirin û nebûne mijarên lêkolînên edebî. Ev xebat, piştî destpêkeke kurt bi kurtejiyana nivîskarî didome. Piştre berhemên Mela ‘Arif ji layê şikl û naverokê ve hatin nirxandin ku mijara eslî ya vê xebatê ye. Em gihaştin vê encamê ku Mela ‘Arif bi berhemên xwe di edebiyata Kurdî de kesayetekî girîng e û şayeste ye ku li ser berhemên wî dahûrandinên edebî yên kûr û hûr werin kirin.

Peyvên Sereke: Edebiyata Kurdî ya Klasîk, Yûsif û Zuleyxa, Serpêhatiya Hezretî ‘Îsa, Fiqha Menzûm, Mela ‘Arifê Dêrsilavî.

Şekil ve İçerik Açısından Molla Arif Dêrsilavî’nin Edebî Mirası Üzerine Bir Değerlendirme

Özet

Şüphesiz milletlerin tarih sayfaları arasında kaybolan, gün yüzüne çıkmayan ve edebiyat literatöründe hak ettiği şekilde yer almayan şair, edip ve nazımlar bulunmaktadır. Türk, Kürt ve Fars edebiyatında zamanla ortaya çıkan yeni eserler ve yazarlar, bu durumun en büyük kanıtıdır. Bu çalışma çok da bilinmeyen ve eserleri tanınmayan Molla Arif Dêrsilavî’nin hayatını ve eserlerini edebi camiaya tanıtmayı amaçlamaktadır. Molla Arif, manzum ilmi ve edebi eserlerin yanında şair kimliğiyle de öne çıkan bir isimdir. Ancak, bugüne kadar eserleri tanıtılmamış ve kapsamlı edebî analizlere tabi tutulmamıştır. Çalışma, kısa bir giriş bölümünün ardından müellifin hayatına dair temel bilgileri sunmakta, ardından esas bölümde eserlerini şekil ve içerik yönünden incelemeye tabi tutmaktadır. Sonuç olarak, Molla Arif’in Kürt edebiyatına kazandırdığı eserlerin, yalnızca bir tanıtımla yetinilmeyecek kadar önemli olduğu ve kapsamlı edebi analizlerle ele alınması gerektiği ortaya çıkmıştır.

Anahtar Kelimeler: Klâsik Kürt Edebiyatı, Yusuf ve Züleyha, Hazreti İsa, Manzum Fıkıh, Molla Arif Dêrsilavî.

BUYDED
BİNGÖL ÜNİVERSİTESİ
YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ DERGİSİ
Yıl/Year: 2025 • Cilt/Volume: 11 • Sayı/Issue: 22

Nurettin Ertekin
nurettin.ertekin@hotmail.com
Orcid: 0000-0003-2744-0447
Dr., Zanîngeha Hekkariyê

Makale Türü /Article Type:
Araştırma Makalesi / Research Article
Makale Geliş Tarihi / Received: 24.06.2025
Makale Kabul Tarihi / Accepted: 4.10.2025
Makale Yayın Tarihi / Published: 31.12.2025
DOI: 10.56491/buydd.1725901

A Critical Assessment of the Literary Heritage of Molla Arif Dêrsilavî: Form and Content Perspectives

Abstract

Undoubtedly, the annals of history are filled with poets, writers, and literary figures who have faded into obscurity and whose works have remained undiscovered. The emergence of new literary works and authors in Turkish, Kurdish, and Persian literature over time is a testament to this phenomenon. This study aims to introduce the life and works of Molla Arif Dêrsilavî, a largely unknown figure whose contributions to literature have yet to receive proper recognition. In addition to his scholarly and poetic compositions, Molla Arif stands out as a poet in his own right. However, his works have not been widely introduced or subjected to in-depth literary analysis. This study begins with a brief introduction, followed by essential biographical details about the author. The core section systematically examines his works from both structural and thematic perspectives. Ultimately, the study underscores the significance of Molla Arif's contributions to Kurdish literature, emphasizing that his works merit not only recognition but also thorough literary analysis. A deeper examination of his writings will provide valuable insights into the broader literary tradition.

Keywords: Classical Kurdish Literature, Yusuf and Zulaikha, Prophet Jesus, Poetic Fiqh, Molla Arif Dêrsilavî.

Destpêk

Zengîniya edebiyata her neteveyekî digel hêmanên dîtir bi zêdebûna şa‘ir û edîban jî dihê pîvan. Lewra her şa‘ir û edîbek bi şêwaza xwe ya takekesî zengîniyekê di bexşîne edebiyata neteweya xwe û di heman demê de dibexşîne ya cîhanê jî. Di vê çerçowê de hemû textên edebî, hemû şa‘ir, edîb û nivîskar ji bo edebiyata neteweyekî girîng in û xwedî nirx in.

Girîngiya edebiyatê ji bo neteweyekî helbet ne mijara destpêka gotarekê ye. Belkî ji çendîn layan ve mijara gotar û berhemên serbixwe ye. Weke kurte dikare were gotin ku edebiyat yek ji hêmanên çandî karîgeriyeke mezin li teşegirtin û avakirina ziman û huwiyeta neteweyî dike.[1] Ji ber vê girîngiya edebiyatê xwedî derketina li hemû berhemên edebî pêwistiyek e.

Yek ji nivîskarên edebiyata Kurdî ku hetanî neha bi şayesteyi kesek lê xwedî derneketiye û li ser berhemên wî xebat nehatine kirin Mela ‘Arifê Dêrsilavî ye. Mela ‘Arif, tiştê ku ji berhemên wî dihê zanîn, nazim û şa‘irekî xwedî şêwazeke taybet e. Bi menzûmeyên xwe di dîroka edebiyata Kurdî de dê cihekî girîng bigire.

Ev xebat, derbarê danasîna Mela ‘Arif û berhemên wî de ye. Di beşa yekem de kurtejiyana Mela ‘Arif hate dayin. Di beşa duyem de em li ser berhemên wî sekinin. Mebesta me ya sereke ji vê xebatê ev e ku Mela ‘Arif û berhemên wî di literatura edebiyata Kurdî de cih bigirin, werin nasîn û bi vî rengî bibin mijarên xebatên akademîk. Lewra her berhemeke Mela ‘Arif şayesteyî xebatên serbixwe nin û herweha kesayetiya wî ya edebî jî. Ji ber vê me dahûrandinên kûr û berfireh nekirin.

1. Kurtejiyana Mela ‘Arifê Dêrsilavî

Mela ‘Arif di dîroka 11.08.1945an de li gundê Dêrsilavê (Erkuran) ku bi navçeya Stewrê (Savur) ya Mêrdîn ve girêdayî ye hatiye dinê. Navê bavê wî Yûsif e. Yûsif kurê ‘Îsa, ‘Îsa kurê Xelîl, Xelîl jî kurê Seydo ye. Navê dayika wî Zînê ye. Zînê keça Ehmedê Dêrsilavî ye. Mela ‘Arif ji ‘eşîra Dêleveriyan e. Dêrsilav, dikeve navbera navçeya Sitewrê ya Mêrdîn û navçeya Bismil ya Amedê.

Mela ‘Arif weke kevneşopiya feqetiyê, pêşî li gundê xwe li cem Mela Nezîrê Zivinga Menda ku kurê Mela Îsma‘îl e dest bi xwendinê dike. Di sala 1955an de li gundê Mixaşnê (Yenilmez) ku ew jî gundeki Stewrê ye li ber destê Mela Şêxmûs dersên fiqhê werdigire. Di dawiya sala 1956an de dihê gundê Xanoserê (Baş Han) ku bi navçeya Bismilê ve girêdayî ye, li medreseya Mela Hemze rêzimana ‘Erebî (serf û nehw) dixwîne. Di sala 1960î de diçe Sînanê (Sinan Köyü) ku ev jî gundekî Bismilê ye, li cem Mela Se’îd xwendina xwe didomîne.

Di sala 1962yan de li Mezra Filla (Molla Hüseyin köyü) ku gundeki Bismilê ye li ba Şêx Me’rûf çendekî dixwîne û li vir dersa çend feqiyan dide. Di sala 1963yan de dîsa vedigere Xanoserê û li wir dixwîne. Di sala 1966an de diçe leşkeriyê. Piştî ji leşkeriyê vedigere ji seydayê xwe Mela Hemze li gundê ‘Îseparê (İsapınar) hinek dersên dîtir werdigire. Piştre diçe Êlihê (Batman) li gundê Tilmercê (Demiryol) di medreseya Mela Selaheddîn de tevî hinek feqiyên xwe xwendina xwe didomîne. Di vê medreseyê de zanistên weke mentiq û îstî’areyê dixwîne. Di sala 1969an de weke 5-6 meha tevî feqiyên xwe li gundê Huccetiyê (Başaklı) ku bi Xana Axpar (Çınar) a Amedê ve girêdayî ye xwendina xwe didomîne. Ji Huccetiyê tevî neh feqiyên xwe dihê gundê ‘Ebbasê (Kartaltepe) ku gundeki Bismilê ye, dixwîne û ji Mela Mehemedê kurê Mela ‘Ebdurrehman îcazeya ‘ilmî werdigire.

Piştî wergirtina îcazeya ‘ilmî li gundê Şêxçopanê (Şeyhçoban) ku gündeki Xana Axpar e dest bi melatiya fexrî dike. Di sala 1971ê de dihê Diyarbekir û li Taxa Rezan (Bağlar) di mizgefta Hecî Muxtar de melatî û muderristiyê dike. Di sala 1972an de dibe melayê nûner û di sala 1974an de dibe melayê fermî. Di sala 1976an de li gundê Zoxê (Damlakaya) ku girêdayî Amedê ye, melatiyê dike. Piştre demekê li gundê Kilwan (Ovabağ) a Xana Axparê û Mizgefta ‘Eziziyê ya navenda Xana Axparê melatiyê dike. Di destpêka sala 1984an de vedigere Amedê li kolana Benû Senê di mizgefta Köşkler de Melatiyê dike. Di dîroka 24.04.1994an de ji melatiya fermî teqawut dibe.

1 Muhemmed Riza Şefi’î Kedkenî. *Mosîqiyê Şi’r*. Tehran: Agah, 1389, 124; Ebu’l-Hesen Necefî. *Tebeqebendiyê Wezinhâyê Şi’rî Fârsî*. Tehran: Nîlufer, 1394, 68.

Mela ‘Arif, piştî ku teqawut dibe acenta geşt û guzarê vedike û xasma bi geşta hecê re mijûl dibe. Aniha Mela ‘Arif dest ji karûbarê dinê berda ye û weke malnişîn li Amedê temenê xwe diborîne. Mela ‘Arif, bi keça meta xwe Qedriye re zewiciye û ji vê zewacê Xweda çar zarok bexşî wan kirine.[2]

2. Berhemên Mela ‘Arifê Dêrsilavî

Hemû berhemên Mela ‘Arif di du bergan de civiyane. Navê bergekî; *el-Fiqhi’l-Menzûm* e. Di vî bergî de fiqha menzûm, jiyana Îmamê Şafi‘î û hinek şi’rên ‘Erebî û Kurdî cih digirin. Di dawiya berhemê de naveroka berhemê nivîsandiye. Ev berhem bi kompîturê hatiye nivîsîn. Nivîskar paşê bi dest hereke (fethe û kesre) kiriye. Ev berhem bi çapeke mehellî hatiye çapkirin. Sala çapê ne diyar e. Bes ji bo belavkirinê navnîşana “Seyda Kîtap Evi” li ser berhemê heye.[3]

Di bergê din de menzûmeya Yûsif û Zuleyxa, Qisseya Hezretî ‘Îsa (s.x.l.) û helbestên Kurdî û ‘Erebî cih digirin. Beşek ji vê kitêbê berhevokên Mela ‘Arif in. Di vê berhevokê de hinek lave û nîşeyên pexşan digel hinek şi’r û menzûmeyên derbarê fanîbûna dinê, biranîna mirinê cih digirin ku hemû bi ‘Erebî nin. Navê vê bergê; *Menzûmetû Gulzarî Can e*. Menzûmeya Yûsif û Zuleyxa, Qisseya Hezretî ‘Îsa (s.x.l.) û helbestên Kurdî îstînsaxa Zeynel’abidîn Amîdî ye. Sala îstînsaxê 2002 ye. Beşa erebî bi kompîturê hatiye nivîsîn. Ev berg jî bi çapeke mehellî ji teref Gap Ofsetê ve di sala 2004an de hatiye çapkirin.[4]

2.1. el-Fiqhu’l-Menzûm

Berhem bi teqdîmeke ‘Erebî dest pê dike. Di vê teqdîmê de piştî hemdên Xweda û selat û selamên li ser Cenabê Pêxember (s.x.l) nivîskar xwe dide nasîn. Piştre sebebê nivîsandina berhemê, çavkaniyên berhemê û navê berhemê hatiye diyarkirin. Di dawiya teqdîmê de nîşeyeke ‘Erebî hatiye dayîn. Di nîşeyê de hatiye nivîsin ku kesê bes ji bo Xweda vê berhemê çap bike û belav bike tu pertalekî dinê jê nayê xwestin û destûra çap û belavkirinê hatiye dayîn.

Menzûmeya fiqhê bi tevahî 140 beş/binbeş e. Nivîskar veke nêrîta berhemên fiqhê sernavên mijaran “Kîtab” daniye. Weke ku ji bo mijara paqijiyê gotiye “Kîtabu’t-Teharetî”. Di binê van serenavên sereke de hemû mijarên bi wê ve girêdayî di binbeşan de hatine nivîsîn. Navên hemû beş û binbeşan bi ‘Erebî nin.

Bi nêrîneke giştî em dişên bibêjin ev berhem ji şeş mijarên sereke ava bûye. Di berhemê de bi tevahî 140 serenav cih digirin û hejmara malikên berhemê 1286 e.

Ev menzûme bi teşeya mesnewiyê hatiye nivîsîn. Bi kêşa ‘erezûke şikestî hatiye nivîsîn. Mirov dikare bibêje bi behra Muteqariba Musemmena Mehzûf e û bi qalibê *Feûlun / Feûlun / Feûlun / Feûl* hatiye nivîsîn û mirov dikare bibêje bi kêşa xomaliya Kurdî bi 11 jî kîteyî hatiye nivîsîn.

Mijarên sereke yên menzûmê ev in;

- **Mijara Paqijiyê.** Ev mijar 24 beş e û 182 malik e. Mijarên weke paqijî, destnimêj, xusil, teyemmum û cenabetî binbeşên vê mijarê ne.
- **Mijara Nimêjê.** Hemû cureyên nimêjê û mijarên rasterast bi nêmijê ve girêdayî ne beş bi beş hatine nivîsîn. Beşên vê mijarê 32 û hejamara malikên wê 269 in.
- **Mijara Zekatê.** Ji bo vê mijarê 14 beş û 93 malik hatine terxankirin.
- **Mijara Rojiyê.** Mijara herî kin e. Bi heft beş û 51 malikî hatiye nivîsîn.
- **Mijara Hecê.** Hec û ‘Umre û mijarên bi wan ve girêdayî di 17 beş û 122 malikan de hatine nirxandin.
- **Mijara Kirîn û Firotin û Danûsitendinê.** Di binê vê mijarê de hemû mijarên fiqhî ku têkildarî jiyana mirovî ye weke; kirîn û firotin, deyn, wekalet, gewahî, riba, mîrat, zewac, jin berdan, kuştin, dizî û wd. cih digirin.

2 Hemû agahiyên derbarî jiyana Mela ‘Arif ji jiyannameya wî ku di dawiya berga berhemên wî ya bi navê *Menzûmetû Gulzarî Can* de ku bi Tirkî hatiye nivîsandin, ji menzûmeya wî ya bi navê *Serpehatiya Îsa Pêxember* ku ji teref Zeynelabidin Zinar li Stockholmê hatiye çapkirin û ji nîşeyên hevdîtina me û Mela ‘Arif di dîroka 24.11.2018 an û 22.06. 2025 an de hatiye berhevkirin.

3 Mela ‘Arif Dêrsilavî, *el-Fiqhi’l-Menzûm*, Seyda Kitap Evi, Diyarbakır, Bê dîrok.

4 Mela ‘Arif Dêrsilavî, *Menzûmetû Gulzarî Can*, Gap Ofset, Diyarbakır, 2004.

Hejmara beşan 46 û hejmara malikan 569 e.

Beşa dawî ya berhemê mijara gewahiyê ye. Di dawiya vê mijarê de di 25 malikan de selat û selamê li ser cenabê Pêxember (s.x.l.), erkanên îmanê, lêborîn û lave xwestin ji xwendevanan cih digire. Herî dawî bi rêzeke pexşan dîroka temamkirina menzûmeyê hatiye diyarkirin. Jê vê dihê fahmkirin ku temamkirina dîroka berhemê 25.05.2005 e.

Malika pêşî ya menzûmeyê:

Esbabê Paqijî bizan çar heb in
Av û ax debax û kevir tev ev in

Malika dawî ya menzûmeyê:

Fatîhe w’sê ixlas bixwûnin bira
Çavê me l’we ye hûn hêvî ne j’me ra

2.2. Behsa Heyata Îmamê Şafi‘î

Ev berhem di eslê xwe de biyografiyeke menzûm e. Jiyana Hezretî Îmamê Şafi‘î, kesayetiya wî ya zanistî û berhemên wî ji xwe re kiriye mijar. Menzûme yek beş e û hejmara malikên wê 77 in. Bi teşeya mesnewiyê hatiye nivîsîn. Kêşa vê menzûmeyê tevî hinek qusûrên ‘erûzê Muteqariba Musemmena Mehzûf e û qalibê wê *Feûlun / Feûlun / Feûlun / Feûl* e.

Malika pêşî ya menzûmeyê:

Ger nav û neseba Îmam şafi‘î
Bixwazî binasî bibî mudde‘î

Malika dawî ya menzûmeyê:

Ilahî bi heqqê Hebîbê xwe kî
Ji feyza ‘ilmê wî me mehrûm nekî

2.3. Yûsuf û Zuleyxa

Serpêhatiya Hezretî Yûsif (s.x.l) û evîna Zuleyxayê ji teref gelek nivîskaran ve hatiye nivîsîn. Yek ji van nivîskaran jî Mela ‘Arifê Dêrsilavî ye. Ev menzûme di berga bi navê *Menzûmetû Gulzarî Can* de bi navê “Fî Qissetî Yûsuf ‘Eleyhisselam we Zuleyxa” cih girtiye. Menzûme weke ji navê wî jî dixwuye jiyana Hezretî Yûsif û evîna Zuleyxayê ji xwe re kiriye mijar. Ev menzûme 12 beş e û serenavê beşan bi ‘erebî hatiye nivîsîn. Hejmara malikên menzûmeyê 1127e. Ev menzûme weke berhemeke serbixwe bi pîtên Latînî û ‘Erebî ji teref Zeynelabidin Zinar ve di sala 2014an de li Stockholmê hatiye çapkirin.[5]

Menzûme ji van beşan pêk hatiye;

- **Beşa Yekem:** Ev beş bê serenav e. Bes di serê beşê de besmeleyeke bi ‘Erebî heye. Hejmara malikan 234 e.
- **Beşa Duyem:** Di vê beşê de Hezretî Yûsif (s.x.l) çewa dibe bende hatiye nivîsîn. Hejmara malikên beşê 31 e.
- **Beşa Sêyem:** Derbarê firotina Hezretî Yûsif (s.x.l) li Sûka Bendayen ya li Misrê de ye. Beş 24 malik e.
- **Beşa Çarem:** Behsa jiyana Hezretî Yûsif (s.x.l) li kaxa ‘Ezîzê Misrê; Quteyfîr dike. Ev beş 119 malik e.
- **Beşa Pêncem:** Derbarê jiyana Hezretî Yûsif (s.x.l) ya di zindanê de ye. 67 malik e.
- **Beşa Şeşem:** Derketina Hezretî Yûsif (s.x.l) ji zindanê û te’yinkirina wî ji bo vezirtiya Wezareta Darayiyê di vê beşê de bi 142 malikan hatiye nivîsîn.
- **Beşa Heftem:** Derbarê zewaca Hezretî Yûsif (s.x.l) bi Zuleyxayê re ye. Beş 42 malik e.

5 Mela Arif Dêrsilavî, *Serpêhatiya Yûsif Pêxember (Yûsuf û Zuleyxa)*, Werger ji Tîpên Eebî: Zeynelabidin Zinar, Pencinar, Stockholm, 2014.

- **Beşa Heyştem:** Salên xelayê û hatina birayên Hezretî Yûsif (s.x.l) bi bal Misrê mijara vê beşê ye. Ev beş 166 malik e.
- **Beşa Nehem:** Ev beş derbarê têkiliyên Hezretî Yûsif (s.x.l) û birayên wî de ye ku li Misrê rû daye, hatiye zimên. Beş 68 malik e.
- **Beşa Dehem:** Derbarê xwe eşkerakirina Hezretî Yûsif (s.x.l) ji birayên xwe de ye. 85 malik e.
- **Beşa Yazdehem:** Hatina Hezretî Ye’qûb (s.x.l) ku bavê Hezretî Yûsif (s.x.l) e tevî malbatê ji Ken’anê bi bal Misrê ve di vê beşê de hatiye nivîsîn. Ev beş 141 malik e.
- **Beşa Duwazdehem:** Di vê beşê de birayên Hezretî Yûsif (s.x.l) pêxember in an ne peyxember in hatiye nirxandin. Ev beş heşt malik e.

Ev menzûme bi kêşa ‘erûzê bi behra Muteqariba Musemmena Mehzûf û bi qalibê *Feûlun / Feûlun / Feûlun / Feûl hatiye nivîsîn.* Bi gelemperî serwaya tekûz di menzûmeyê dihê dîtin

Malika pêşî ya menzûmeyê:

Bi navê Xweda ez dikim îbtida
Dikim hemd û şukran li Barî Xwuda

Malika dawî ya menzûmeyê:

Xusûsen bide xatirê Ehmeda
Dikim zar û fixan bi sewt û seda

2.4. Serpêhatiya ‘Îsa Pêxember

Jiyan û taybetiyên Hezretî ‘Îsa (s.x.l) ji gelek layan ve bala şa‘ir û naziman kişandiye. Ji ber vê gelek xalên jiyan û taybetiyên Hezretî ‘Îsa (s.x.l) di şi’r û menzûmeyan de dihên ditîn. Lê hetanî niha me di derbarê jiyana Hezretî ‘Îsa (s.x.l) de menzûmeyên serbixwe nedîtine.[6] Û belkî ev menzûmeya Mela ‘Arifê Dêrsilavî di vê mijarê de menzûmeya yekem be. Menzûme 9 beş û 415 malik e. Ev menzûme jî weke berhemeke serbixwe bi pîtên Latînî û ‘Erebî ji teref Zeynelabidin Zinar ve di sala 2014an de li Stockholmê hatiye çapkirin.[7] Ev menzûme jî bi behra Muteqariba Musemmena Mehzûf û bi qalibê *Feûlun / Feûlun / Feûlun / Feûl* hatiye hûnadin. Menzûme ji van beşan pêk hatiye;

- **Beşa Yekem:** Ji vê beşê re serenav nehatiye dayîn. Li şûna serenav bi ‘erebî besmele heye. Di vê beşê de esl û neseba Hezretî Meryem, ji dayikbûna Hezretî ‘Îsa (s.x.l) û çûna wan ya Misrê hatiye vegotin. Hejmara malikên beşê 193 ye.
- **Beşa Duyem:** Behsê dike ji jiyana Hezretî ‘Îsa (s.x.l) li Misrê. Beş 17 malik e.
- **Beşa Sêyem:** Ev beş di derbarê derketina Hezretî ‘Îsa (s.x.l) ji Misrê û gihaştina wî ya Şamê de ye. Beş 35 malik e.
- **Beşa Çarem:** Mijara vê beşê sifra xwarinê ye ki bu du‘ayên Hezretî ‘Îsa (s.x.l) ji asîman nazilî ser erdê bûye. Derbarê sifra xwarinê de rîwayeta yekem jî hatiye nirxandin. 13 malik e.
- **Beşa Pêncem:** Derbarê sifra xwarinê de rîwayeta duyem hatiye nirxandin. 48 malik e.
- **Beşa Şeşem:** Derbarê sifra xwarinê de rîwayeta sêyem hatiye nirxandin. Beş 14 malik e.
- **Beşa Heftem:** Hesûdiya cihûyan ji Hezretî ‘Îsa (s.x.l) û xwestina kuştina wî mijara vê beşê ye. Beş 26 malik e.

6 Seydî Kiraz di gotara xwe ya bi navê “Türk İslam Edebiyatında Bir Peygamber Portresi: Hz. İsa” de ku ji teza wî ya masterê hatiye deranîn de dibêje di edebiyata Tirkî de derbarê jiyana Hezretî’Îsa (s.x.l.) de em rastî menzûmeyên serbixwe nehatin. (Seydî Kiraz, “Türk İslam Edebiyatında Bir Peygamber Portresi: Hz. İsa”, *Ekev Akademi Dergisi*, Yıl 18, sayı 60, 2014, 261-280, 278.) Di edebiyata Kurdî jî de em rastî menzûmeyeke bi vê mijarê nehatine. Herweha li gorî lêkolînên me di edebiyata Farsî de ku hebîn jî derbarê Hezretî ’Îsa (s.x.l.) de em rastî menzûmeyên serbixwe nehatin.

7 Mela Arif Dêrsilavî, *Serpêhatiya Îsa Pêxember (Qisetu Îsa Îbni Meryem)*, Werger ji Tîpên Eebî: Zeynelabidin Zinar, Pencinar, Stockholm, 2014.

• **Beşa Heyştem:** Cihû ji bedel Hezretî ‘Îsa (s.x.l) ve çawa hevalê xwe dikujin û çûyîna Hezretî ‘Îsa (s.x.l) bi asîmana di vê beşê de hatiye zimên. Hejmara malikên beşê 43 ê ye.

• **Beş Nehem:** Hinek pirsen nivîskarî ji filehan di derbarê ku Hezretî ‘Îsa (s.x.l) çewa lawê Xweda ye di vê beşê de cih girtiye. Beş 26 malik e.

Malika yekem ya menzûmeyê:

Dikim îbtida ez bi navê Ehed
Dewam hemd û şukran li Rebbê Semed

Malika dawî ya menzûmeyê:

Ku xeyru’l-kelamî ma qelle we dell
Qete’tû lî haza we qelbî melel[8]

2.5. Keşkûl (Mecmû‘e-Berhevok)

Mela ‘Arif, ji bo xwendevanê xwe hişyar bike û bala wan bikêşe ser mirinê û rewşa piştî mirinê ji ayetên Qur’ana Pîroz, hedîsên Cenabê Pêxember (s.x.l) û gotinên ehlê ‘ilmê hinek pexşan û hinek menzûm keşkûleke ‘Erebî nivîsandiye. Navê keşkûla xwe weha daniye: “Îxtînamu’l-Ewqat, fi’l-Baqiyati’s-Salîhat, Qeble Hucumî Hadîmi’l-Lezzat.” Wate: Xenîmetên demê, ji kiryarên ku daîmî dimînin li cem Xweda, beriya êrîşa ku çêja di hedimîne.

Keşkûl bi destpêkeke musecce’ (pexşana bi serwa) hatiye nivîsîn. Di vê destpêkê de nivîskar mebesta nivîsandina keşkûlê û navê wê diyar dike. Keşkûl tevî destpêkê ji 28 sehîfe û rûpelekê pêk hatiye. Di keşkûlê de çendîn nîşe û şi’rên derbarê hişyarkirina însanan li hember mirinê û rewşa piştî mirinê, gotinên kesayetên qedirbilind, laveyên ji bo bexşandinê û munacat cih digirin. Weke li jor jî hate gotin ev keşkûl di berga bi navê *Menzûmetû Gulzarî Can* de cih girtiye.

2.6. Helbestên Kurdî û ‘Erebî

Di herdû bergên ku berhemên Mela ‘Arif di wan de hatine tomarkirin de hinek şi’rên Kurdî û ‘Erebî jî cih digirin. Hinek ji van şi’ran yên Mela ‘Arif in û hinek ji wan jî ne yên wî nin. Di nava wan şi’ran de şeş şi’rên Mela ‘Arifî cih digirin ku sisê ji wan bi Kurdî û sisê jî bi ‘Erebî nin. Herweha şeş şi’rên dîtir jî cih girtine ku yek bi Kurdî ye û em negihaştin şa‘irê wê û pênc şi’r jî bi ‘Erebî nin.

Helbestên Mela ‘Arif yên Kurdî

Di nava herdu bergan de em rastî sê helbestên kurdî dihên ku ev helbest yên Mela ‘Arif in.

• **Helbesta Yekem**: Teşeya helbestê terkîbî benda murebbe’ e.[9] Ev helbest di berga bi navê *Menzûmetû Gulzarî Can* de ye. Di vê helbestê de di malikên bendan de yekîtiya serwayê nayê dîtin. Serwaya tekûz û ya zengîn bi hevre hatiye bi kar anîn. Di malikên wasitaya bendan de paşserwa dihê dîtin. Herweha di malikên wasitaya bendan de serwa nehatiye bi kar anîn. Di vê helbestê de tevî hebûna hinek qusûrên ‘erûzê mirov dikare bibêje bi behra Hezeca Musemmena Salim bi qalibê *Mefa‘îlun / Mefa‘îlun / Mefa‘îlun /Mefa‘îlun* hatiye nivîsîn.

Benda yekem ya helbestê:

Eya ‘Arif tu ta’et ke li vî halî şev û roj e
Ji dil carek di ewwel da xem û derdan tu bavêje

8 Ev malik bi ‘Erebî ye. Wate: ji ber ku peyva herê bikêr kêm û di cîde ye, ji ber vê min gotinên xwe kurt kir lê dilê min melûl ma.

9 Ev helbest li gorî teşeyên edebiyata Tirkî; Museddesa Mutekerrîr e. (bnr: M. A. Yekta Saraç, *Klasîk Edebiyat Bilgisi, Biçim-Ölçü-Kafiye*, Gükkubbe, 10. Baskı, İstanbul 2017, s 135.) Lê li gorî teşeyên edebiyata Farsî; Terkîbî Benda Murebbe’ e. (bnr: Saraç, *Klasîk Edebiyat Bilgisi, Biçim-Ölçü-Kafiye*, s 179 ; Mensûr Restgar Fesayî, *Enwa’ê Şi’rê Farsî,* Întîşaratê Nuwêd, Şîraz, Îran 1380 r 555 ; Celaleddîn Humayî, *Finûnê Belaxat û Sina‘atê Edebî*, Çapxaneê Sitare, Îran 1373, r 185. Veyis Değirmençay, *Fünûn-i Belâgat Ve Sınâât-ı Edebî*, Aktif, Ankara 2014, s 41-47.) Bi nêrîna min, ji bo teşeyên edebiyata Kurdî teşeyên edebiyata Farsî ji teşeyên edebiyata Tirkî guncavtir in. Ji ber vê me jî ji bo vê helbestê got; Terkîbî Benda Murebbe’.

Weki carek li meydanê heçî şa‘ir bike gêj e
Li rexşê tu suwar be can tu xweş ş‘ira dîsa bêje

Me îmdad bavi Fatma ê qebûl ke j’ummeta xwe
Ez xerîb im bê kes im dûr im ji meqsûda dilê xwe

Benda dawî ya helbestê:

Ela ey ‘Arifê muznib qeti’ ke tu evî derdî
Mesrur be tû dinêv ixwan meger tû şa‘irek merdî

Bibêje tû ji qelb û dil wekî bulbul li ser werdî
Feqet bes te telef kir can tu deyne şûşeya badî

Me îmdad bavi Fatma ê qebûl ke j’ummeta xwe
Ez xerîb im bê kes im dûr im ji meqsûda dilê xwe[10]

Taybetiyeke vê şi’rê ev e ku şa’ir di benda dawî de malikên wasitayê kirine sisê. Di misraya sêyem de dîroka nivîsandina helbestê bi hesabê ebcedê diyar kiriye. Ev hesabkirin ne li gorî dîroka hîcrî ye, li gorî dîroka mîladî ye. Şa‘ir dîrok di bêjeya “Etweh (اطوح)” ê de veşartiye ku li gorî hesabê ebcedê dibe sala 1968. Misra weha ye:

*Di tarîxa **etweh** min got li ser derd û kulê xwe*

- **Helbesta Duyem:** Ev helbest jî bi teşeya terkîbî benda murebbe’ê hatiye hûnandin. Lê weke helbesta jorîn malikên wasiteyê ne dudo ne, yek e. Taybetiyeke vê helbestê ev e ku şa‘ir malika wasiteya benda dawî cuda hûnaye. Di malika wasiteya bendan de serwaya tekûz hatiye bi kar anîn. Serwaya malika wasiteya benda –an- e. Lê di malika wasiteya benda dawî de di bêjeya “seyda” de serwa şikandiye.

Helbest, ji layê kêşê ve bi behra Hezeca Musemmena Exreba Mekfûfa Meqsûr û bi qalibê Mef‘ûlu / Mefa‘îlu / Mefa‘îlu / Mefa‘îl hatiye hûnandin. Helbet hinek qusûrê ‘erûzê jî di helbestê de dihê dîtin.

Benda yekem ya helbestê:

Dîsa ku bibêjim kul û derdan û xemînan
Dil nake tehemmul ji ber wec‘an û birînan
‘Ebdalek besît im li ber dergahê te dîsan
Rehmê ke tu carek li esîrê xwe di zindan
Îmdadê dixwazim ji te ey Xaliqê Rehman

Benda dawî ya helbestê:

Ey ‘Arifê muznib bes dirêj ke li vî halî
Boş can te telef kir herî paşê di vî çalî
‘Eqreb û mar û mûr te bixwun ca bi melalî
Goştê li te em kin te bikin hestiyê xalî
Bes hew ez dibêjim emir daye li min seyda[11]

- **Helbesta Sêyem:** Ev helbest munacat e. Bi teşeya mesnewiyê hatiye hûnandin. Tevî hinek qusûrên ‘erûzê bi behra Muteqariba Musemmena Mehzûf, bi qalibê *Fe‘ûlun / Fe‘ûlun / Fe‘ûlun / Fe‘ûl* hatiye nivîsîn. Di helbestê de tevî serwaya tekûz başserwa jî hatiye bi kar anîn.

Malika yekem ya helbestê:

Ya Reb min ‘efû ke ji sebqa lisan
Ji qewlê muxalif ku hatî ziman

10 Dêrsilavî, *Menzûmetu Gulzarî Can*, 101-103.
11 Dêrsilavî, *Menzûmetu Gulzarî Can*, 105-106.

Malika dawî ya helbestê:

Hecîka xeta in ku teshîh bikin
Heçîka sewab in ku tesdîq bikin[12]

Helbestên Mela ‘Arif yên ‘Erebî

Mela ‘Arif bi zimanê ‘Erebî sê helbest hûnandiye.

• **Helbesta Yekem:** Ev helbest weke ku şa‘irî di serenavê wê de eşkara dike di derbarê wesfê Cenabê Pêxember (s.x.l.) de ye. Bi gotineke din helbest ne’t e. Bi teşeya qit‘eyê hatiye nivîsîn. 12 malik e.

Malika yekem:

في وقتٍ من الدهر عاش الناسُ في رغدٍ

معْ افضلِ الناسِ صارَ ٱلكُلُّ اخوانا[١٣]

Malika dawî:

شرع الدين قائِدَنا[١٤] وَلْيحفظِ اللّٰه

معلمُ دينِنا علماً وبنيانا[15]

• **Helbesta Duyem:** Ji bo vê helbestê nivîskar ev serenav daniye: Ev qesîdeya hanê dema ku ez li gundê ‘Ebasê talib bûm min nivîsandiye. Helbest bi teşeya mesnewiyê ye. Di vê helbestê de navê hevalên wî yên feqî hatine diyarkirin.

Malika yekem:

اسماءُ طُلّابِ علوم الادبِ

والمنطقْ و المناظره لي كالطُّبِ[١٦]

Malika dawî:

رافقنا في حينٍ منالزمانِ[17]

وكنت نابغاً على التّوانى[18]

• **Helbesta Sêyem:** Ev helbest bi teşeya qit‘e yê hatiye nivîsîn. Di nîşeya binê helbestê de dîroka helbestê 1969 hatiye dayin. Mijara helbestê evîn e.

Malika yekem:

الا لا تلوموني بلوم هزيّانٍ

لقد ارتجال الشعر مني وقد عرضى[19]

Malika dawî:

تأدبْ ايا عارف ولا تلتخ الشعر[20]

يلوك لسانك في شعر لا يرتضى[21]

12 Dêrsilavî, *el-fiqhu’l-menzûm,* 157-158.
13 Wate: di wê dema ku însan di kêfxweşiyê de û tevî însanê herî qençê înasana (wate Pêxemberê Xweda) dijîyan însan hemû bûbûn weke bira ji hevre.
14 Wate: Xweda rêya dînê pêşengê me biparêze, ku ew ji layê zanebûn û avakirênê ve mamosteyê dînê me ye.
15 Dêrsilavî, *Menzûmetu Gulzarî Can*, 102-105.
16 Wate: Navê talibên ilmê edebê û mentiqê û munazerê û pizişkiyê.
17 Wate: Me hevaltî dikir di demekê de, ku bi alikariya wan hevalan sistayî ji min çû û ez bûm kesekî zîrek.
18 Dêrsilavî, *Menzûmetu Gulzarî Can*, 107-108.
19 Kesek bila loma li mi neke bi lomeyên tewş, lewra şi’rên min jixweber derketên holê.
20 Bi şerde be ey ‘Arif, şi’rê gemarî neke, tiştê ku nayê qebûlkirin bila neyê ser zimanê te.
21 Dêrsilavî, *el-fiqhu’l-menzûm,* 150.

Helbestên Kurdî ne yên Mela ‘Arif

Di dawîya berga bi navê *el-Fiqhu’l-Menzûm* de helbesteke Kurdî cih digire. Nivîskar ji bo vê helbestê di serenavê bi ‘Erebî de weha dibêje. “Hinek levz in lê kê gotiye ji teref min nayê zanîn.” Helbest bi keşa xomaliya Kurdî ye. Di her misrayekê de heyşt kîte cih digirin. Taybetiya vê helbestê ev e ku bi benda ava bûye. Di her bendekê de du malik henin û her bendek di nava xwe da bi serwa ye. Hinek bend jî bi paşserwa nin. Bi tevahî 28 bend e. Eger nav li vê helbestê were kirin belkî em bikaribin bibêjin ev helbest bi teşeya çarpareyê hatiye nivîsîn.[22] Rabirduya vê teşeyê û bi vê serwabendiyê digihêje Feqiyê Teyran. Di dîwana Feqîyê Teyran de menzûmeya “Şerê Dimdimê” bi vê teşeyê Hûnandiye.[23] Piştî Feqiyê Teyran, helbestên bi vî rengî di dîwanên gelek şa‘irên Kurmancî axêv dihê dîtîn.[24] Herweha helbestên bi vî rengî di edebiyata Zazakî jî de cih girtinin. Di dîwana Mela Kamilê Pûexî de em rastî helbesteke bi vî rengê dibin.[25]

Benda yekem:

Ey insanê kurê insan
Qet Rebbê xwe neke nisyan
Di ta‘et da nebe keslan
Ji agir ra mebe qurban

Benda dawî:

Îmana bê ‘emel ha ye
Wekî mûma li ber ba ye
Wê bitefî bê xela ye
Islamî jî tev wusa ye[26]

Helbestên ‘Erebî ne yên Mela ‘Arif

Di dawîya *el-fiqhu’l-menzûm* de pênc helbestên ‘Erebî cih digirin. Nivîskar ji bo van helbestan tu şa‘ir û çavkanîyan nişan nade. Di lêkolînê de em têgihiştin ku yek ji van helbestan ya Hezretî Huseyn e (r.x.l).[27] Helbestek ya Îmamê Şafi‘î ye[28] û sê helbest jî şa‘irên wan ne diyar in.[29]

Encam

Di vê xebatê de kurtejiyana Mela ‘Arifê Dêrsilavî hate dayin û danasîna berhemên wî hatin kirin. Di jiyana Mela ‘Arif de xala balkêş ev e ku tevî feqiyên xwe xwendina xwe li çendîn deveran domandiye. Di pêvajoya xwendina medreseyê de feqiyên pêşketî dersên feqiyên ku berhemên destpêkê dixwînin, didin. Lê di jiyana melayên me de em rast nehatine ku kesek tevî feqiyên xwe li medreseyan xwendine. Ev xal ji bo peyitandina xwendina medreseyên Kurdan xaleke gelekî girîng e.

Mela ‘Arif hem şa‘ir e û hem nazim e. Lê nazimtiya Mela ‘Arif serdesttirî şa‘irtiya wî ye. Lewra em dibînin ku menzûmeyên wî ji şi’rên wî bêtir in. Mela ‘Arif bi tevahî şeş şi’r hûnandiye ku sê şi’r bi Kurdî û sê şi’r jî bi ‘Erebî nin. Herçend ku şi’rên wî hindik bin jî weke şa’irekî du zimanî divê were hesibandin û di dîroka edebiyata Kurdî de were tomarkirin.

22 Çarpare ew teşeya nezmê ye ku ji dubeytiyên li pey hev hatine hûnandin dihê gotin. Ji bo agahiyên zêdetir bnr: Xemkûrê Xursî, *Nûra Nepenî*, (Amd: Nurettin Ertekin), Peywend, Wan, 2022, r 53-55; Sîrus Şemîsa, *Enwa‘ê Edebî*, Întîşaratê Mîtra, Wîrayişê Çiharom, Tehran, Îran 1386, r 314-315; Fesayî, *Enwa’ê Şi’rê Farsî,* r 456.

23 Bnr: M. Xalid Sadînî, *Feqiyê Teyran: Jiyan, Berhem û Helbestên Wî*. Nûbihar, Stenbol, 2013, r 383.

24 Bnr: Xursî, *Nûra Nepenî*, (Amd: Nurettin Ertekin), Peywend, Wan, 2022, r 53-55.

25 Bnr: Mela Kamilê Pûeğî, *Dîwan*, (Hedrekar: Murat Varol), Vir, İstanbul 2020, r 78.

26 Dêrsilavî, *el-fiqhu’l-menzûm,* 159-162.

27 Ji bo vê helbestê bnr: Mûhemmed Reyşehrî, *Cewahiru’l-hîkmetî Lî Îmam Ebî ‘Ebdullah Huseyn*, Muessesetî Daru’l-hedîs, Qûm, 1385, r 503.

28 Ji bo vê helbestê bnr: https://rattibha.com/thread/1336597158682832898. (Pêgihîn: 10.06.2025)

29 Ji van helbestên ku şa‘irên wan nediyar in yek jê di berhema bi navê ez-zehru’l-faîh te cih digire. Bnr: Muhemmed bin Muhemmed bin Yûsuf el-Cezerî, *ez-zehru’l-faîh fî Zikrî Men Tenezzehû ‘eni’z-zunûbî we’l-qebaîh*, Daru’l-Kutûbi’l- ‘İlmîyyetî, Beyrût, 1986, r 122. Herdu helbestên dîtir jî di berhema bi navê mecmu‘eya qesîdeyên zuhdê de cih digirin. Bnr: ‘Ebdul‘ezîz Muhemmed Selman, *Mecmû‘etû Qesaîdu’z-Zuhdiyyatî*, Metabi‘î el-Xalid Li’l-Ufset, Riyad, 1409, c 1, r 518 û 562.

Menzûmeya derbarê zanista fiqhê, zêdayiyek e di nivîsandiana berhemên fiqhê û xasma fiqhên menzûm de. Ev menzûme di heman demê de dide xuyakirin ku Mela ‘Arif ‘alimekî şareza ye ku dikare bi nezm berhemeke fiqhê derxîne holê. Menzûmeya Yûsif û Zuleyxayê di edebiyata Kurdîd e ji bo menzûmeyên ‘aşiqane gelek girîng e. Lewra hejmarekê li menzûmeyên ‘Aşiqane û menzûmeyên Yûsif û Zuleyxayên Kurdî zêde dike.

Serpêhatiya Hezretî ‘Îsa li gorî lêkolînên me di edebiyata Kurdî de cara yekem ji teref Mela ‘Arif bi nezm hatiye nivîsîn. Girîngiya vê menzûmeyê ji vê derdikeve holê. Jiyannameya Îmamê Şafi’î li biyografiyên menzûm yên edebiyata Kurdî hejmareke din zêde dike. Herweha hestên Mela ‘Arif yên derbarê Îmamên mezhebên ‘emelî jî derdixîne holê. Di berhevokên şi’rên Mela ‘Arif de bidestxistina helbesteke Kurdî, her çend ku şa’irê wê ne diyar be jî, ji bo edebiyata Kurdî girîng e.

Şi’rên Mela ‘Arif ne zede nin. Sê şi’rên wî bi Kurdî û sê şi’rên wî bi ‘Erebî nin. Çewa ku hate gotin nazimtiya wî pêşketîtir e ji şa’irtiya wî. Lewra di şi’rên wî de hem qusûrên kêşa ‘erûzê û hem qusûrên serwabendiyê dihê dîtin. Di van şi’ran de bêtir rewşa derûnî ya derbarê tirsa axretê dihê dîtin. Di nava şi’rên ku wî tomarkiriye hebûna helbestek ku şa’irê wê nediyar e ji bo edebiyata Kurdî xwedî nirx e.

Mela ‘Arif bi menzûmeyên xwe û şi’rên xwe yên Kurdî û ‘Erebî ji bo edebiyata Kurdî ya klasîk rengînî û dewlemendiyek e. Berhemên Mela ‘Arif bi van taybetiyên xwe şayeste nin ku ji teref lêkolîneran ve werin nirxandin û xalên wan yên ciyawaz bi peywendîdaran re werin parvekirin. Di heman demê de pêwist e li ser kesayetiya edebî ya Mela ‘Arif jî xebatên serbixwe werin kirin.

Çavkanî

Değirmençay, Veyis. *Fünûn-i Belâgat Ve Sınâât-ı Edebî*, Ankara: Aktif, 2014,

Dêrsilavî, Mela ‘Arif. *el-Fiqhi’l-Menzûm*, Seyda Kitap Evi, Diyarbakır, Bê dîrok.

Dêrsilavî, Mela ‘Arif. *Menzûmetû Gulzarî Can*, Gap Ofset, Diyarbakır, 2004.

Dêrsilavî, Mela Arif. *Serpêhatiya Îsa Pêxember (Qisetu Îsa Îbni Meryem)*, Werger ji Tîpên Eebî: Zeynelabidin Zinar, Pencinar, Stockholm, 2014.

Dêrsilavî, Mela Arif. *Serpêhatiya Yûsif Pêxember (Yûsuf û Zuleyxa)*, Werger ji Tîpên Erebî: Zeynelabidin Zinar, Pencinar, Stockholm, 2014.

el-Cezerî, Muhemmed bin Muhemmed bin Yûsuf, *ez-zehru’l-faîh fî Zikrî Men Tenezzehû ‘Eni’z-Zunûbî we’l-Qebaîh*, Daru’l-Kutûbi’l-‘İlmîyyetî, Beyrût, 1986.

Fesayî, Mensûr Restgar. *Enwa’ê Şi’rê Farisî*, Întîşaratê Nuwêd, Şîraz, Îran 1380.

Humayî, Celaleddîn. *Finûnê Belaxat û Sina‘atê Edebî*. Îran: Çapxaneê Sitare, 1373.

Kedkenî, Muhemmed Rida Şefi‘î. *Mûsîki-yi Şi’r*. Tehran: Âgâh, 1389.

Kiraz, Seydî. “Türk İslam Edebiyatında Bir Peygamber Portresi: Hz. İsa”, *Ekev Akademi Dergisi*, Yıl 18, sayı 60, 2014, 261-280.

Necefî, Ebu’l-Hesan. *Tebeqebendi-yi Wezinhâ-yi Şi’rî Fârsî*. Tehran: Nîlufer, 1394.

Pûeğî, Mela Kamil. Dîwan, (Hedrekar: Murat Varol), İstanbul: Vir, 2020.

Reyşehrî, Mûhemmed. *Cewahiru’l-hîkmetî Lî Îmam Ebî ‘Ebdullah Huseyn*, Muessesetî Daru’l-hedîs, Qûm, 1385.

Sadînî, M. X. Feqiyê Teyran: Jiyan, Berhem û Helbestên Wî. Stenbol: Nûbihar, 2013.

Saraç, M. A. Yekta. *Klasîk Edebiyat Bilgisi, Biçim-Ölçü-Kafîye*. İstanbul: Gükkubbe, 10. Baskı, 2017.

Selman, ‘Ebdul‘ezîz Muhemmed. *Mecmû‘etû Qesaîdu’z-Zuhdiyyatî*, Metabi‘î el-Xalid Li’l-Ufset, Riyad, 1409.

Şemîsa, Sîrus. *Enwa‘ê Edebî*, Întîşaratê Mîtra, Wîrayişê Çiharom, Tehran, Îran 1386, r 314-315.

Xemkûrê Xursî, *Nûra Nepenî*, (Amd: Nurettin Ertekin), Peywend, Wan, 2022.

https://rattibha.com/thread/1336597158682832898. (Pêgihîn: 10.06.2025)

Pêvek 1: Wêneyên herdu bergên berhemên Mela ‘Arifê Dêrsilavî.





Pêvek 2: Wêneyê Mela ‘Arifê Dêrsilavî ku me di dîroka 24.11.2018 an de kêşa bû.

